

Kurmancî (Nordkurdiska)

Ersättning från a-kassan -
Information om ekonomisk ersättning när du
är arbetslös

2015-11

Tezmînata ji Kasaya bêkarîyê

Agahî di derbarê tezmînata aborî de dema tu bêkarî.

Di nav wê demê de ku tu li karekî digerî dikarî ji Kasaya bêkarîyê (a-kassan) tezmînata aborî wergirî. Tezmînata, cihê tenê beşek ji hatina te ya aborî ya ji kar dadigire. Ji bo tu karibî vê tezmînate wergirî pêwîst e tu hîn şertan bicîh bînî. Heger tu kêmasî salekî endamê kasayeke bêkarîyê bûyî wê demê dikarî tezmînateke bilindtir wergirî. Lê her weha tu yê ku ne endamê kasayeke bêkarîyê yî ji dikarî tezmînata wergirî.

Di nav bransên cuda de bi giştî 28 kasayên bêkarîyê hene. Heger tu hetanî niha nebûyî endama yek ji wan dikarî berê xwe bidî kasayeke bêkarîyê ku tu dixwazî bibî endama wê.

Li webcîha www.samorg.org/om-arbetsloshetsforsakringen yan jî www.arbetsformedlingen.se/a-kassa bêtir agahî hene.

Ji bo tezmînata wergirî çi pêwîst e?

Ji bo karibî ji kasaya bêkarîyê tezmînata wergirî divê tu berî her tiştî şerta bingehîn bicîh bînî.

Ev tê wê maneyê ku pêwîst e tu

- li cem Daîreya karî (Arbetsförmedlingen) xwe weke kesekî li kar digere qeyd bikî
- karibî kêmasî rojane 3 saet û heftane binavcînî 17 saet li cem karbidestek bixebitî
- wekî din ji bazara kar re amade bî, yanî nîyeta te hebe ku tu kar bikî û bi tiştên din re ku ji vê re dikare bibe asteng mijûl nebî

Pêwîst e tu her weha şerteke xebatê ji bicîh bînî. Ev tê wê wateyê ku divê te têra xwe kar kiribe. Ji bo agahîyên li ser vê yekê û daxwazkirina tezmînata bêkarîyê, bi kasaya bêkarîyê ya ku tu endama wê yî yan jî dixwazî bibî endama wê re têkilî deyne.

Divê di nav wê demê de ku ez tezmînatê werdigirim çî bikim?

Dema tu ji kasaya bêkarîyê tezmînatê werdigirî gelekî girîng e ku tu, her wekî te û karmendê daîreya karî li hev kirîyê, li kar bigerî. Ev tê wê maneyê ku tu

- bi tevî karmendê daîreya karî re planeke tevgerê ya şexsî (individuell handlingsplan) amade dikin
- di wextê de rapora çalakîyê (aktivitetsrapport) bidî Daîreya karî
- di têkilî û serdana Daîreya karî yan jî şîrket û rêxistinên ku Daîreya karî bi wan re hevkarîyê dike de ji wexta we li ser li hev kirîye hayedar bî
- serî li wan cure karan bidî ku bi ya me rêkûpêk in û dikarin ji bo te baş bin
- serî li karên din bidî ku li gorî bawerîya te baş û rêkûpêk in

Her weha girîng e tu bi van awayan dema xwe ya bêkarîyê dirêj nekî:

- redkirina tekîfa karekî rêkûpêk
- nîşandana hal û tevgerên ku dikrare bibe sedema wendakirina derfeteke karî
- qebûlnekirina programeke sîyaseta bazara kar ya ku tu ji bo wê alîkarîya çalakîyê (aktivitetsstöd) werdigirî.

Tu her weha nikarî bi van awayan bibî sebeba bêkarîya xwe:

- bêyî sebebek di cîh de berdana karê xwe
- nîşandana hal û hereketên bi wî rengî ya dike ku tu ji kar werî avêtin
- derketina ji programeke sîyaseta bazara kar ya ku tu ji bo wê alîkarîya çalakîyê (aktivitetsstöd) werdigirî
- nîşandana hal û hereketên wisa ku bibe sedem ku Daîreya karî programeke sîyaseta bazara kar ya ku tu ji bo wê alîkarîya çalakîyê (aktivitetsstöd) werdigirî rawestîne.

Heger guhertinek çêbe me agahdar bike!

Di derbarê wan tiştan de ku dikare bandor û tesîrê li ser tezmînata te bike kasaya bêkarîyê ya xwe agahdar bike, weke mînak heger tu dest bi xwendinê yan jî kar bikî.

Heger tu adres, e-name yan jî hejmara telefona xwe biguherîni vê yekê ji Daîreya karî re bibêje ku em her tim karibin xwe bigihînin te.

Dixwazî li derveyê welat kar bikî?

Te li welatekî din ya girêdayî Yekîtiya Ewrûpayê/EES yan jî li Swîsreyê kar kirîye? Yan jî difikirî li derveyê welat li kar bigerî? Wê demê qaîdeyên taybetî derbas dibin. Heger dixwazî li ser vê babetê bêtir tişt hîn bibî bi kasaya bêkarîyê ya xwe re têkilî deyne.

Daîreya karî vî karî dike

- dema xwe li vir dinivîsînî agahî dide kasaya bêkarîyê û te li cem Daîreya karî weke kesekî li kar digere qeyd dike
- kontrolê dike ka gelo tu wan şertên ji bo wergirtina tezmînata kasaya bêkarîyê bi cîh tîni yan na
- ji kasaya bêkarîyê ya te re agahdarîyek dişîne heger tu
 - şertan bi cîh naynî
 - her wekî te û karmendê daîreya karî li hev kirîye serî li kar nadî
 - dema bêkarîya xwe dirêj dikî
 - bi xwe dibî sedema bêkarîya xwe

Kasaya bêkarîyê bi vî karî radibe

- lêkolîn dike û biryarê dide ka mafê te heye tu tezmînat ji kasaya bêkarîyê wergirî
- biryarê dide ka çiqas tezmînat dikarî wergirî
- tezmînata te dide
- di derbarê tezmînata te de bersiva pirsan dide
- biryarê dide ka gelo divê tezmînata te kêmbike, ji ber ku Daîreya karî di vî derbarî de agahdarîyek ji kasaya bêkarîyê re şandîye.